

Pîşeyên di Kommunalê de

Kommunal endaman ku di nav çend sed komên pîşeyî yên cuda de ne organîze dike. Kardêr di nav belediye, parêzgeh û kertê/sektora taybetî de hene.

Endamên Kommunalê sexbêrîya pîran dikin, firavînê ji bo şagirdên dibistanê çê dikin û li pêşdibistanê û di demvalahîyê de çavdêrîya zarokan dikin. Em otobusan diajon, agiran vedimirînin, pixêrîyan ji tenîyê paqij dikin û ambulansan diajon. Dîsa em in yên ku li baxçeyê heywanan çavdêrîya heywanan dikin, sexbêrîya giyayê meydana golfê dikin û deraseyan li zevîyên gundan diajon. Me pîşeyên xwe di duzdeh branşên cuda de civandine.

Seqetî

Di nav vê branşê de, endamên Kommunalê karê alîkarîkirina mirovên seqet dikin. Cihê karî dikare malên nexweşên nefsi bin, xaniyên koma seqetan bin, cihê çalakîyên rojane yên pîran bin, cihê razanê yê kesên bêxani bin yan malên tedawî û çavdêrîyê bin. Alîkarê şexsî, lênêr/sexbêrkar, piştgirê kesê ku xwedî êşa nefsi ye û di malekê de dijî, alîkarê seqetan, perwerdekarê seqetan, sexbêrkar, karmendê guncandinê û refaquetkar/rêberê seqetan hin ji pîşeyan in.

Pêşdibistan û dibistan

Di nav branşa Pêşdibistan û dibistanê de, endamên Kommunalê hene ku pîşeya wan sexbêrkarê zarokan, lênêrê/çavdêrê zarokên pêşdibistanê, rêberê demvalahîyê û alîkarê şagirdan e. Sexbêrkarê zarokan koma herî mezin e. Gelek kardar di kertê/sektora belediyeyê de dixebitin, lê kertê/sektora taybetî, bo nimûne komkarên dêûbav yan karmendan, xebata xêrxwazî yan dîni, mezin dibe.

Kertê/saktora kes

Di kertê/saktora kes de, endamên Kommunalê di çandinîyê, meydana hespan, meydana golfê yan sexbêrkarîya heywanan de dixebitin. Ev endam li belediyeyan, parêzgehan û şîrketên şexsî kardar in. Cihgirê demkî, lênêr/sexbêrkarê heywanan, sexbêrkarê teyrên kedî, karkerê meydana golfê, sexbêrkarê hespan, sexbêrkarê makîneyan, karkerê baxçeyan, traktorajo, karkerê tesîsên baxçeyan û baxçevan hin ji pîşeyan in.

Xizmetên nava malê

Gelek pîşe û wezîfe yên ku li malên kesên bi rê ve diçin dikevin nav çarçoveya xizmetên nava malê. Divê branşê de, endamên Kommunalê karên paqijkirin, çavdêrîkirina zarokan, xwarinçêkirin, pencerepaqijkirin û baxçevanîyê dikin.

Sexbêrîya tendirustî û nexweşan

Sexbêrîya tendirustî û nexweşan di Kommunalê de ji branşên herî mezin e. Di wê de, endam hene ku wek alîkarê hemşîreyê/sîsterê, sexbêrkar, sexbêrkarê nexweşan yê ambulansê, taybetmendê sexbêrîya pêyan, otopsikar/teknîkerê termqelaştinê, teknîkerê xesandinê û alîkarê çareserkirina nexweşên karî dixebitin. Herêm û parêzgeh kardêrên mezin in, lê sêxbêrîyên şîrketdar û şexî jî hene. Capio û Vardaga ji mitehidên/miqawilên mezin in.

Metbex û xwaringeh

Di bransa metbex û xwaringehê de, endamên Kommunalê hene ku wek xwaringçêker, çêkerê/a xwarinên sar, karmendê danên xwarê û alîkarê aborîyê dixebitin. Bi giştî, metbexên mezin cihên karî ne. Ev xebat di cihên lênêrîna nexweşan, cihên çavdêrîya salmezinan û dibistanan de tên bi rê ve birin.

Xizmetên rizgarkirinê

Di çarçoveya xizmetên rizgarkirinê de, endamên Kommunalê wek agirkujên tamwext yan wek karmendên xizmetên rizgarkirinê yên di hazirîyê de – yên ku berê bi agirkujên paçewext dihatin bi nav kirin – dixebitin.

Teknîk, eqar och sexbêrî

Di bransa Teknîk, eqar û sexbêrîyê de, endamên Kommunalê rûyê derve û hundirê eqar û tesîsên din sexbêrî dikin. Sexbêrkarê eqaran, paqijkerê xaniyan û karmendê melevangeh/avjenîgeh û werzişgehan hin ji pîşeyan in.

Teknîk, park û tesîsat/avahî

Di bransa Teknîk, park och tesîsatan de, endamên Kommunalê di warê tesîsatan, şuxilandin û kargêrîyê ya kolan, av û karêzan, miamelekirina bermayîyan/gilêşî û paqijkirinê de dixebitin. Karkerê paqijkirinê, teknîkerê jîngehê, karkerê vebikaranînê, hostayê elektrîkê, teknîkerê av û karêzan, xerat/necar û borîkêş hin ji pîşeyan in. Adet ew li ba şîrketên belediyeyan yan şîrketên ku peymanên wan bi belediyeyan re hene kardar in.

Trafîk

Di vê bransê de, otobusajo koma herî mezin e. Tramajo, karkerê tamîrgehê/fiterîyê, tamîrkar, karmendê xizmetgehê, paqijker, karmendê paqijkirina wasîteyan, karkerê garajan û xizmetkarê trafîkê hin komên pîşeyî yên din in.

Civatên dînî

Di vê bransê de, Kommunal endamên han organîze dike: karkerê goristanê, nobedarê goristanê, karkerê cihê termşewitandinê, baxçevan, karkerê karên destan, wasîteajo, karkerê temîrgehê/fiterîyê, kevirsaz, paqijker, nobedar, nobedarê dêrê/kilîseyê, kebanî, rêberê çavdêrîya zarokan û çavdêrê zarokan.

Lênêrîna pîran

Lênêrîna pîran bransa Kommunalê ya herî mezin e û tê de nêzîkî sêyeka endaman dixebitin. Alîkarên hemşîreyan/sîsteran koma karî ya herî mezin e.